

Pênûs û Hubir. Tiştekan din naxwaze. Ji hevdîtina pêşî ya pênûsê û pelikê, lehîya bûyeran dizê. Derîyên hindek mecalan tên girtin, lê hindekên din vedibin. Xêzikek dibe rû, gogek dibe hewr, kevana rêzikek dibe serê çûkek. Dinyayek dest bi avabûnê dike.

Xêzikên Îbrahîm Yassîn, ji van karêzên sirûştî dizên. Ji xêzika pêşî ya pênûsê, hemû derî li ber vedibin. Paşî xêzika din û ya din tê û nişkevda gupika/xunçeya wêneyê vedide. Ji xwe divê wesa be. Bi piranî, wêneyên nas in, lê di rûpelên hember da, Îbrahîm Yassîn nîşandide, ku ew dikare li gel motîvên abstrakt jî kar bike. Lê her kîjan jî be, hestên wî wan bi rê ve dibe. Hestên hunermend xwe di wê da nîşan dide, ku em hemû bikarin jê tê bigehin, hest pê biken. Ew jî, ji zanîna hevbeş a mirovayetîyê tê.

Îbrahîm Yassîn gelek wêneyên daran neqîş kirîye. Em dikarin bêjin, ku motîva daran nirxdarê ber dilê wî ye.

Darên Îbrahîm Yassîn, bi piranî bi du qurman in û çiqîlên wan di ser û ber hevra li hev dialin. Rîtma van neqşên arabesk, helwesta her wêneyê xuya dike.

"Dîyalog" yek ji wan e bi du qurman, ku xwe li hev dipêçin û li dawîyê da, di nav xwe da, ew êdî nikarin ji hev cuda bibin. Ev jî mecal dide Îbrahîm Yassîn, da nîşan bide, ku dan û standina navbera mirovan, malbatan, welatan li gel hev, divê bi rêzgirtin û bi dîyalog be.

"Di Destpêkek Nû" da, du çûk hene ku li hev alane. Hinde nêzikên hevin, ku wek yek caneberin. Nîşanek hestiyar ji bo evînî, bawerîya beranberî û rêzgirtinê. Bi xêzikên taybetî, herdu çûk di nav hev da dikelin û bi yek cût pêyên hevbeş, li ser axê bi pişterast radiwestin.

Motîvên Îbrahîm dikarin wek dîyardeyan têkilhev jî bin. Çawan mirov bikare gêjavîya nav mejî û hestên xwe da derbibire? "Berebilavîya bîr" yek ji wan e. Wek qulatek li pelikê ketîye û li pêş çavên me wek du balonan ji qoqê serê ve derdikeve. Fîgurek hişîn bi hovane xwe dibre nav leşê û guman û dîsharmonîyê dide der.

Yên dawîyê "Tirs" û "Ji kêfan Difire" jî nîşan didin, bi yek fîgurê çawan hestên cida dikarin bîn derbirîn. Di "Tirs" da, dev û rûyê hişk û req ê mirovek, bi hewrên metirsîdar dilgiranîya rewşa di wêneyê da nîşan dide. Bi vajîyê wê, di "Ji Kêfan Difire" da, form girover û sistin û li cihê hewrê reş, bafirokek nermîş li ber bayê difire.

Hestên mirovan û rewşa hişên wan, ku ji me hemîyan ra nas in. Eva kakilê kartêkerê hunera Îbrahîm Yassîn e.

Têkist bi danîmarkî: Tom Jørgensen

Wergêrandin: Hozan Bengî